Utlendingsdirektoratet
Norwegian Directorate
of Immigration

# Zanyarî liser awayê bikaranîna zanyariyên şexsî li kempê

Wekû kesekî penaber, wê kemp bi awayekî baş li te miqate be.

Kemp û Birêveberiya karûbarên biyaniyan (UDI) wê bikaribin dest bidin wan zanyariyên te ên şexsî da ku bikaribin

- ciyekî li kempê pêşkêşî te bikin
- pereyên ku ji heqê te ne bidin te
- guhdaneke baş bidin te wekû penaberekî qasir û bi tenê
- li dûv rewşa te biçin bi awayekî ku ji rewşa te re minasib e, li kempa ku tu lê dijî
- li dûv rewşa te biçin eger hat û te refz liser daxwaznameya xwe wergirt û êdî liser te ferz e tu vegerî welatê xwe

Da ku em bikaribin vî tiştî bicîbînin lazim e ku kemp, liser navê UDI, navê te qeyd bikê û hinekan ji zanyariyên te ên şexsî bikarbînê.

Dema em dest didin zanyariyên te ên şexsî, em vî tiştî dikin di çarçeva wan qanûnan de ku erk û wacibên me rêkdixin, û ev jî qanûna biyaniyan, qanûna idarî û qanûna parastina zanyariyên şexsî ne.

Liser kempê û UDI wacibê parastina nihêniyê (sirriyetê) heye û ew dikarin zanyariyên te ên şexsî bidin terefên din eger qanûn rê bide vî tiştî yan jî eger tu razî bî.

**Tu dikarî peywendiyê bi kempê re bikî ji bona wergirtina zanyariyan liser**

- ka wan çi zanyariyên şexsî liser te tomar kirine
- jêdera zanyariyan kû dere
- ew çawa tên bikaranîn
- ew çawa hatine parastin

Tu dikarî bixwazî ku zanyariyên liser te ên ku xelet in bêne rastkirin yan rakirin. Her wusa tu dikarî ji kempê yan UDI bixwazî ku kopiyekê ji zanyariyên te bidin te.

Tu dikarî zêdetir bixwînî liser ka UDI çawa zanyariyên te ên şexsî bikartîne di daxuyaniya parastina nihêniya şexsan de ya Birêveberiya karûbarên biyaniyan (UDI). Ev liser udi.no heye.

## Imze û mikurhatin

☐ Ez mikur têm ku min ev zanyariyên ku di vê nivîsê de hatine, fam kirine.

| | |
|---|---|
| Cî û mejû | Imza penaber / welîemr |